

نۆزەنکردنەوہی وەلامەکان / ۱۴

ئەگەر پیمانواپیت، وەلامەکانی ئیمە تەواو و دوا دەرکی مروڤایەتین، ئەوا خەریکین لە خۆمان بتیک سازدەکەین. ھەروەھا ئەگەر پیمانواپیت، ئەو سیستەمی ریکخستنە ی کۆمەلگە، کە ئیمە خەباتی بۆ دەکەین، دواپین چاوەروانی و گەشەپەکە، کە مروڤایەتی پێدەگات، ئەوا دیسانەوہ خەریکین پوچگەراییەکی دی لە تەپوتۆزی پوچگەراییەکانی دیکە، چێدەکەینەوہ. سۆشالیزم بەھەشتیک نییە لە ئاسمانەکانەوہ داگیرین و لە پەراوی ئەفسانەکاندا بیدۆزینەوہ و مۆدیرنیزە ی بکەین، سۆشالیزم خەونی مروڤی زیندووہ و بە پراکتیکی شۆرشگێرانی کەتواری دەبیتەوہ و سەرکەوتنیشی لە کولتوربوویندا دەبیت، بەی ئەوہ، لە خەیاڵی گۆشەگیرانە و فەنتازی ئایدیالیستانە بەولاوہتر نابیت. ھەژین

بەشی چوار دەھەم

ئایا پەيوەندی سەروزەکان لەگەڵ ئانارشیستەکان چییە؟ مەگەر ئەوانیش ئانارشیست نین؟

بۆ ئەوہی بتوانم وەلام بە پرسیارەکانت بەدەمەوہ، ناچار لە کۆتاییەوہ دەستپێدەکەم. ئەگەر مەبەستت لە "سەروزەکان"، پارتە سەروزەکانی ئەوروپا و ولاتانی دیکەن، ئەوا بەدلتیاییەوہ دەتوانم بلیم نا. چونکە پێش ھەموو شتیک ئەوان "سەروزەکان" پارتی پامیاریین و ئەنارکیستەکان پارتایەتی رەتدەکەنەوہ و منیش بۆ خۆم ویپرای پارتایەتی، پامیارییش رەتدەکەمەوہ. دەکریت رۆژگاریک ئەندامانی ئیستای پارتە سەروزەکان بەجۆریک ئەنارکیست بووبن، یا ئیستاش سۆزدارییان بۆ ئەنارکیزم ھەبیت، بەلام ھیچ کات ئەو دوو ئاراستە یە کسان و ھاوتانین. چونکە پێش ھەموو شت ئەوان بۆ دەسەلاتی پامیاریی ھەول دەدەن و لە کایە ی پامیاریی و پارلەمانتاری و بە پارتییکردنی کەسەکاندا چارەسەر دەخەنەپوو، کە ئەوہش رەتکردنەوہی بنەما ھزرییەکانی ئەنارکیزمە؛ بزوتنەوہی کۆمەلایەتی دەروہی قەوارە پامیاریی و قووچکەییەکان.

وہک گوتم دەکریت، ئەوان وەک تاک و گروپ رۆژگاریک بەشیک بووبن لە ئەنارکیستەکان و بۆ ژینگەپاریزی خەباتیانکردبیت و چالاک ی بزوتنەوہی دژە-ئەتۆم و دژەجەنگ و زۆر شتی دیکە بووبن، چونکە ئەنارکیزم وەک شیوازی بێرکردنەوہ و وەک ھزر و وەک بزوتنەوہیەکی فرەرەھەندی کۆمەلایەتی، لە گشت بوارەکاندا تیروانینی ئازادخووانە و دژە-سەرورەنە ھەییە؛ لەوانە تیروانین لەمەر ریکخستن جەماوہریی و کۆمەلایەتی [ئەنارکۆسەندیکالیزم]، تیروانین لەمەر لەنیووردنی ھەلاواردنی ستەمی رەگەزی بەرانبەر ژنان [ئەنارکۆفینیزم]، تیروانین لەمەر دژایەتی جەنگ و ئاشتییخووازی [ئەنارکۆپاسیفیزم]، تیروانین لەمەر پاراستنی ژینگە [Green anarchism / eco-anarchism]، تیروانین لەمەر رزگاری ئازەل [animal libertarian front] و... تە.

لە تیروانین ئەنارکییەکاندا و بە بۆچوونی منیش، تیکدانی ژینگە و پیسکردنی ئاو و

ههوا و هوڭارى روودانى كارهساتهكان، تهنيا بو نهزانى مروڤهكان ناگهريتهوه، بهلكو بو چاوچنوڭكى و زورتخووازيى بوڭواكان دهگهريتهوه، كه لهپيناو بهدهستهيئانى سوودى زياتر و پاوانگهريى زياتر، ژيان لهسهر گوڭى زهوى بهرهو تياچوون دهبن. به سهرنجدانكى خيرا له پيشهسازيى نهوت و ئوتومهبيلى و چهكسازيى و وزهئى تهئومى و پيشهسازييه ناپويست و زيانبهخشهكانى ديكه، ئهو راستييهمان بو دهردهكهويىت كه لهم جيهانهدا خهريكه چى دهگوزهريىت و داهاتووى مروڤايهتى له سايهى سيستمى راميارىيى و سهروهريى چينايهتييدا چون دهبيىت. به پيچهوانهئى پاگهندهئى راميارانهوه، كه هوڭارهكان بو نهزانين و نهخويندهوارىيى تاكهكان دهگريپنهوه، دهركى دانىشتووانه بوومييهكانى ئهمريكا [ئهووانهئى كه كوچره ئهوروپييهكان جينوئسايد / وهچهبريانكردن] لهمهپ پاراستنى ژينگه زور له دهركى فيلوئسوڤ زانكانى ئهم سهردهمه روشتنتر و دروستتر بووه و تهنيا هوڭار كه ژينگه و بوونهوهرهكانى بهم روژگار كيشاوه، كوومهلكهئى چينايهتييه، كه لهپيناو قازانجى سهرمايهداران و سهروهريى رامياران و مشهخوريى دهسهلاتداراندا نامادهئى زيان لهنيوبهريىت، لهم بارهوه ههر ئهوهنده بهسه، كه كاتى ههلكردنى رهشهبا سهرنجى ئاسمانى ههولير و سليمانى و...تد بدهين، كه چون كيسه (دلڤ / عهلاگه) وهك هيرشيكى ئاسمانى، ئاسمانى شار داگيردهكهن، يا سهرنجى تهپوتوز و خوئبارين و چره دووكهئى ئهكسووسى ئوتومهبيلهكان بدهن، تا تيبگهين كه بازارى سهرمايهدارى خهريكه ژينگه و مروڤايهتى بهرهو كوئى دهبات. ئيدى با ئهوه لهو لاهو بوهستىت، كه پيشهسازى گوشت و شيرهمنهئى چ كارهساڭك دروستدهكات !

ئهگهر لهم بارهوه به وردى و ههستهوهرييهوه سهرنجى ههلوپيست و ستراتيجى پارته سهروزهكان بدهين، ئهوا دهبنين كه ئهوان خووازيارىيى سهرمايهدارىيى ژير و به بهزهبين، خهريكى ئاموزگاربيكردى ئافهرينهرانى چهكى ئهتومين، خهريكى بزوواندى سوز و بههزيى راميارانن بهرانبهر ژينگه و بوونهوهرهكانى، خهريكى ئاموزگاربيكردى دهلالانى بازارهكانى چهكسازيى و ئوتومهبيلسازييين. ئهمهش بوخوى به ديوهكهئى ديكهدا ههر سوشيالديموكراسييه، كه به ئاموزگاربيكردى سهرمايهداران دهستبييكرد و ويستى به بهشداربيكردى جهنگى جيهانى دووهم، مروڤايهتى رزگاربيكات ! ليڤهده لهتهك پرسياربيك رووبهرووين، ئايا بهئى لهنيوبردنى هوڭارهكانى / پيوستىييهكانى چهك و وزهئى تهئومى، بهئى لهنيوبردنى هاندهرهكانى پيشهسازى ئوتومهبيلى و نهوت و چهكسازى و .تد [گهپانهوه بو وزهئى سروشتى (ئاو و با و خوڤ) و لهنيوبردنى سيستم و سهروهريى و مشهخوريى و دهسهلات]، دهتوانين ژينگهئى پاريزراو مسوگهركهين؟ ئهگهر دهكرىت، چون و بوچى تا ئىستا لهپيناويدا كارنهكراوه، كئى و چى ريگره و هوڭارهكان چين؟

ناژهلدوستى پهيوهندى به ئهنارشيزم و كوومهلكهئى بى جينايهتيهوه چييه ؟

پيش ههموو شت پيوسته له رووى زمانهوانىيهوه وهلام به پرسيارهكه بدهمهوه، كه "بى جينايهتى" نادرسته و "ناچينايهتى دروسته". ئينجا له راستيدا ستهمگهريى مروڤ له ناژهلتازارىيى [سيكس لهتهك ئاژهل و ليڤان و سواربوون و زيندانىكردى له مال و باخچهكان] و بههرهكيشيى [بهكاربردنى ئاژهل بو باربهريى و پيشهسازىيكردى

بەرھەمھېنایى گۆشت و شېرەمەنى] و رەھايەتیبیدان بە کوشتن و سەندنەوھى مافى ژيان لە ئازەل کورتناپیتەوھ و کوتاییناپیت، بەلکو ستەمگەرېیەكە بەرھو ستەمکردن لە خودى ھاوجۆرەکانى مرۆف درېژکراوھتەوھ. چونکە یەكەمىن رەھايەتیبیدان بە توندوتیژى و کوشتار لە ئەفسانەکانى دروستکردنى دونیا لەلایەن سوپەرھېزى ئافەرىنەوھ [اللە/گۆد] بە خاترى مرۆف، دەستپېدەكات و لەویدا مرۆف خۆى وھك سەرورەى بوونەوھەرەکانى دیکە وینادەكات و پاشان دەكەویتە ھەولى دەستەمۆکردنى ھاوجۆرەکانى خۆیشى. بەواتایەكى دیکە كاتىك مرۆف بە لاسایىکردنەوھى درندەبى ئازەلەکانى دەوروبەرى خۆى، ھەولى خواردنى ئەوانى دیکەى داوھ، بەھۆى فراوانى ھوشمەندىیەوھ لەو سنورە ناھوشيارى و ناچارىیانەى بۆ زىندوویمانەوھ نەوھستاوھ و كەوتووھتە ھەولى کوشتن و كۆیلەکردنى ھاوجۆرەکانى خۆى، كە لە ھىچ ئازەللىكى [بوونەوھرىكى] دیکەدا ئەو دیاردەىە نىیە و تەنەت درندەترین ئازەل، كە گورگ كراوھتە ھىماى، ھىچ كات ھاوجۆرى خۆى ناخوات و لەوھش واوھتر ھىندە ھاوپشت و كۆمەلگەراىە، كە ھەمىشە پىكەوھ و بە كۆمەل لەژياندان. بەلام مرۆف ھەم بكورژى ھاوجۆرەکانى خۆیەتى، ھەم بخۆرى گۆشتى ھاوجۆرەکانى و ھەم كۆیلەگەر و زىندانىگەر و فرۆشەر و كړپارى ھاوجۆرەکانىەتى؛ لەیەك دەستەواژەدا درندەترین و بىبەزەبىترین ئازلى سەر گۆى زەمىن، درندەىەك كە بە ھوشيارىیەوھ درندایەتى بە پلان و لىكۆلینەوھ و دارپشتنى ستراىىچ و بەكاربردنى تاكتىك [ھونەرى سەرورەى: راميارى] پەرەپېدەدات و بەرانبەر ھاوجۆرەکانى خۆى [مرۆفە ژىردەستەكان] و ئازەلەکانى دیکە و ژىنگە دەپگرىتەبەر.

ئەناركىزم وھك مېتۆدى تىپرامان و بىرکردنەوھ لە دیاردەكان و گەبىشتن بە ھوشيارى، پەرەتگەرەوھى بەھرەكېشىیە، نەك تەنیا لەنۆوان مرۆفەكاندا، بەلکو پەرەتگەرەوھى بەھرەكېشىى مرۆفیشە لە ئازەلانى دەوروبەرى، پەرەتگەرەوھى توندوتیژى و كوشتنى ھەموو بوونەوھرىكە. واتە ئەناركىزم پەرەتگەرەوھى تاوانە نەك تەنیا پەرخنەگر لە تاوانبار، دژى ستەم و بەھرەكېشىیە نەك تەنیا ستەم و بەھرەكېشىى لە مرۆف، خوازىارىى ئازادى ژيانە بۆ ھەمووان، نەك تەنیا بۆ ھەلگرانى ھزرى خۆى. بىچگە لەمە، وھك تۆلستۆى دەبىژىت "تا بازارى قەسابخانەكان گەرم بىت، زرم و ھورپى بەرەكانى جەنگىش بەردەوام دەبىت". چونكە یەكىك لە ھۆكارە ھەرە كۆنەكانى جەنگ و درېژەكېشان و مانەوھى بۆ سەردەمى ئىمە، پەھايەتیدانە بە كوشتنى ئەوانى دیکە لەپىناو مانەوھ و پاشایەتى خود. ھەرۆھا یەكىك لە تايبەتمەندىیەكانى مرۆف رەھاتن و ملدانە بە بارىك، ھەرچەندە پىشتەر نەیتوانىبىت، لەتەكیدا ھەلېكات. باشترین نمونەش رەھىنانى پۆلىس و سوپا و دەستە تىرۆرىستىبەكانە ھەر لە كۆنەوھ تا ئىستا لەسەر پاكردن و سەرپرىنى ئازەل، كە كوشتن لەلای دەكاتە شتىكى ئاساىى، لەو بارەوھ دەتوانىت سەرنجى فىلمى رەھىنانى دەستە تىرۆرىستىبە ئىسلامىبەكان لە عىراقى پاش روخاندنى رژیمنى بەعس بەدەیت، كە چۆن وھك سەرگەرمىبەك بەدەم گوتن و گویپادىپران لە سروودە ئابىنىبەكان، دەكەونە تەقەکردن و سەرپرىنى وشتن و ئازەلانى دیکە.

لەلایەكى دیکەوھ، بەگوىرەى پشكنىن و لىكۆلینەوھ زانسىتىبەكان دەرکەوتووھ، كە شلەژاوى و فشارىك كە لەلای ئازەل لەكاتى سەرپرىدا دروستدەبىت، لەپرىگەى خواردنى گۆشتەكەىەوھ بۆ مرۆفى گۆشخور دەگوىزىتەوھ، ئەمە بىچگە نەخۆشىبەكان و لاوازبوونى

سىستەمى بەرلەخۇكردنى جەستەى مروڧ بەھۆى پاشكارايى ئەو دەرمانانەى لە كە شوئىنەكانى پەرودەكردنى پىشەسازىيانەى ئازلان بە ئازەلان دەدرىن بەتايىبەت پاشكارايى ئەنتى بايوتىك. بەو جۆرە دەبىنن، كە كوشتن و خواردنى ئازەل بەگشتى پارىزەر و درىژەپىدەرى درندايەتى و توندوتىژى و بەھرەكئىشى و چەپاندنى ھاوجور و جۆرەكانى دىكەى ئازەل لەلەى مروڧ ئاسايى و ئاساندەكات. ئەگەر بەراوردى رادەى توندوتىژى و درندەبى مروڧى جارن و مروڧى ئەم سەردەمە بكەن، ئەوا دەبىنن يەكئىك لە ھۆكارەكان زوربوونى تواناى گۆشخورىيە . كاتئىك كە مروڧ رېگە بەخۆى بدات، ئازەلان بكوزئىت و بخوات و بخاتە خزمەت خۆشگوزەرانىى خۆى و لە كار و لە شتى دىكەدا بەھرەكئىشى لە ئازەلان بكات، ئىدى چۆن دەكرئىت چاوەرپىيى ئەوەى لى بكرئىت، كە بتوانئىت كۆمەلگەيەكى خالى لە ستەم و بەھرەكئىشى و توندوتىژى بنىاتبنئىت؟ كاتئىك مروڧ ئەو بوونەوەرە بئىت، كە توانىبئىتى درندەبى ناچارى و ناھوشيارانەى ئازەلەكانى دىكە لەرېگەى زانست و تەكنۆلۇجىا و زىرەكىى خۆبەوە بە بەرزترىن لووتكە بگەبئىنئىت، ئىدى چۆن دەتواننن پاگەندەكانى لەمەر ئازادى و يەكسانى و دادپەرورەبىخوازىى بە ھەندوەر بگرىن ؟

بە نەزەرى تۆ سۆشئاللىزم و سەرمایەدارى گەمەى خوا و ئەھرىمەن نىە ؟

بەبۆچوونى من، مروڧى سەرتايى ۋەك بەرەنجامى تىرپامانى لە دەوروبەرى و بئىسنوورىى گەردوون، لە بئوولامى پرسىيار و سەرنجەكانىدا، ناچار ھىزئىكى سۆپەرمانى لە ھۆش و ئاۋەزى خۇيدا ئافراندوۋە، دوابەدۋاى ئەو ھەرفىنەرى سۆپەرھىز بۆ ئەوەى خۆى لە يەخەگىرىى پرسىيارە چاۋەرۋاننەكراۋەكان رزگار بكات، ئەو سۆپەرھىزەى بەرەو بۆشايى ئاسمان رەوانەكردوۋە. كاتئىك كە وپراى بوونى ئەو سۆپەرھىزە ترسىنەرەش، ھەندىك لە مروڧەكان دەستبەردارى خراپەكارىى نەبوون [ھەلبەتە خراپەكارىى لە رۋانگەى كولتور و رېكەوتنى كۆمەلەيەتى ئەو كۆمەلەۋە]، دىسانەوە لە بئوولامى ئەو پرسىيارەدا " بۆ مروڧەكان ۋەك يەكدى نىن و ھەندىكىان سەركئىشىدەكەن؟ "، ئافەرئىنەرانى سۆپەر-ھىز ناچار بە ئافراندى سۆپەرھىزئىكى دىكە بوون؛ سۆپەرھىزئىكى سەركئىش، تاۋەكو پاساۋى خراپەكانى خۇيانى پىدەنەوە و بىكەنە ھۆكار. بەلام ئافەرئىنەرانى سۆپەرھىز نەيانزانى، كە لە چىكردنى سۆپەر-ھىزى دوۋەمدا يەكەمىن ھىزى ئازادىخواز وئىنادەكەن. لەبەرئەو لەو رۆژەو سۆپەرھىزى يەكەم، بەدەست پارادۆكس و گىرقتىكەۋە گىرۆدەيە، كە ناتوانئىت سۆپەرھىزى دوۋەم لەنئوۋىيەرىت، چۈنكە لە لەنئوۋىردنى ئەودا، خۆى لەنئوۋەبات، ھۆكارى ئەمەش ئەوەيە، كە دەسلەت بەبى دژ ناتوانئىت پاساۋى بوون و پىداۋىستى مانەۋەى خۆى بدات. بەواتايەكى دىكە نە ئافەرئىنەرانى سۆپەرھىزى يەكەم [مروڧەكان] تواناى دەربازبوونىان لە خۆشباۋەرىيەكى مئژوۋىيى كە خۇيان بەرانبەر ئافەرئىنراۋەكەى خۇيان ھەيانە، رزگار بكەن و نە سۆپەرھىزى يەكەم دەتوانئىت بەبى ھاۋەلدوۋانەى خراپەكار، باشى و پئوۋىستى خۆى بسەلمئىنئىت.

لە راستىدا ئەم جەنگە مئژوۋىيە بەردەوامەى نئوان "گۆد / اللە" و ئەھرىمەن، لەئاسمانەكان و لە خەيالى كۆيلە خۆشباۋەرەكاندا نىيە، بەلكو لە زىانى كەتۋارىى ھەر

پۆژەى ئىيمە [ئىيمەى مرۆڧى ئازادىخواز و مرۆڧى سەركەوتگەر؛ مرۆڧى پەنجەر و مرۆڧى پەنجەر و پەنجەر، لەنيوان مرۆڧى ئاشتىواز و مرۆڧى پوانگەر و سەرورەىيخوازدايه]دايه و ھەر لىرە لەنيو ھەموو بوونيكى ئىيمەدا بووني ھەيه، لەو كاتەوھى كە سەرورەىي سىكوچكەى سوپەر-ھىز-پەرەستگە - ئىمپراتۆر گۆراوھ بە سەرورەىي سەرمایە - پارلەمان - دەولەت، سوپەرھىزەكانى سەرزەوى ھەردەم خەرىكى قوتكردنەوھى ھىزى لاسار و خراپەكارن، تاوھكو پاساوى مانەوھ و پىداويستى خويان بەدەنەوھ .

نەخىر، تا ئەوئەندەى بۆ بۆچوونى من دەگەرپتەوھ، يەكەم ھاوكىشەكە ئاوەژوو خراوھتەروو، گۆد/ اللە/ دەولەت سەرچاوھ و راگرى خراپەكارىيە و ئەھرىمەن، كە مرۆڧە ياخيەكانن، خوازيارى ئازادى و رزگارى و سەربەخويى و يەكسانى و دادپەرورەيىن . بۆ گەيشتن بەو ئامانجانەش بەبى لىدان و لەنيوبردنى ئەو ھىزە خراپەكارەى، كە ئەوى ھەك كۆيلە راگرتووھ و بەبى لەنيوبردنى كۆيلەتى خوى، ئەستەمە ئەو بازنە داخراوھى بەردەوامىي چەوسانەوھ بشكىت و مرۆڧ بە قوناخىكى بالاتر لە گەشەى كەسايەتى [تاكى ئازاد] بگات . بەواتايەكى دىكە كۆيلە بۆ رزگاربوونى لە كۆتوبەندەكان، پىويستە كۆيلايەتى لەنيوبرەيت، ئەو لەنيوبردنەش تەنيا بە گۆرپنى كۆمەلگەى چىنايەتى بۆ كۆمەلگەيەكى ناچىنايەتى، واتە لەنيوبردنى زەمىنە و ھۆكارەكانى كۆيلەبوون [دارايى تايبەت ، كارىكرىگرتە ، سەرورەىي مرۆڧ بەسەر مرۆڧەوھ] مەيسەردەبىت !

خویندەوھى بەشى يەكەم، كرتە لەسەر ئەم بەستەرەى خواروھ بگە :

- بەشى يەكەم : <http://wp.me/ppHbY-HN>
- بەشى دووھم : <http://wp.me/ppHbY-HY>
- بەشى سىيەم : <http://wp.me/ppHbY-If>
- بەشى چوارەم : <http://wp.me/ppHbY-IH>
- بەشى پىنجەم : <http://wp.me/ppHbY-IN>
- بەشى شەشەم : <http://wp.me/ppHbY-Jg>
- بەشى ھەوتەم : <http://wp.me/ppHbY-Jo>
- بەشى ھەشتەم : <http://wp.me/ppHbY-Jv>
- بەشى نۆھەم : <http://wp.me/ppHbY-JO>
- بەشى دەھەم : <http://wp.me/ppHbY-JZ>
- بەشى يازدەھەم : <http://wp.me/ppHbY-K5>
- بەشى دەھەم : <http://wp.me/ppHbY-K9>
- بەشى سىد دەھەم : <http://wp.me/ppHbY-Kf>

praktîkî şorrşigêrrane ketwarîyê debêtewe û serkewtinîşî le kultûrbûyînda debêt, bebê ewe, le xeyallî goşegêrrane û fentazî aydialîstane bewlawetir nabêt. Hejên

Beşî çwardehem

Aya peywendî seruzekan legell anar îstekan çîye? Meger ewanî anar îst nîn?

Bo ewey bitwanîm wellam be pirsyarekant bdemewe, naçar le kotayyewe destipêdekem. Eger mebestit le "seruzekan", parte sewzekanî ewrupa û wllatanî dîken, ewa bedillnyayyewe detwanîm bllêm na. Çunke pê hemû têk ewan "sewzekan" partî ramyarîyn û enarkîstekan partayetî retdekenewe û mnî bo xom wêrray partayetî, ramyarîyê retdekemewe. Dekrêt rojgarêk endamanî êstay parte sewzekan becorêk enarkîst bûbin, ya êsta sozdarîyan bo enarkîzm hebêt, bellam hîç kat ew dû arasteye yeksan û hawtanîn. Çunke pê hemû it ewan bo desellatî ramyarîyê hewilldeden û le kayey ramyarîyê û parlamantarî û be partîyîkirdnî kesekanda çareser dexenerrû, ke ewe retkirdnewey bnema hizrîyekanî enarkîzme; bzûtnewey komellayetîyê derewey qeware ramyarîyê û qûçkeyyekan.

Wek gutim dekrêt, ewan wek tak û grup rojgarêk be êk bûbin le enarkîstekan û bo jîngeparîzîyê xebatyanîkirdbêt û çalakî bzûtnewey dje-etom û djeceng û zor tî dîke bûbin, çunke enarkîzm wek êwazî bîrkirdnewe û wek hzir û wek bzûtneweyekî frerrehendî komellayetîyê, le gi t bwarekanda têrrwanîna azadîxwazane û dje-serweraney heyê; lewane têrrwanîna lemerr rêkxistinî cemawerîyê û komellayetîyê [enarkosendîkalîzm], têrrwanîna lemerr lenêwbirdnî hellawardinî stemî regezîyê beranber jnan [enarkofênîzm], têrrwanîna lemerr djayetî ceng û a tîyixwazîyê [enarko-pasîfîzm], têrrwanîna lemerr parastîna jînge [Green anarchism / eco-anarchism], têrrwanîna lemerr rizgarî ajell [animal libertain front] û ...tid.

Le têrrwanîna enarkîyekanî û be boçûnî mnî, têkdanî jînge û pîskirdnî aw û hewa û hokarî rûdanî karesatekan, tenya bo nezanî mrovekan nagerrêtewe, bellku bo çawçnokî û zortrixwazîyê bocwakan degerrêtewe, ke lepênaw bedestihênanî sûdî zyatir û pawangerîyê zyatir, jyan Leser goy zewî berew tyaçûnê debên. Be serincdanêkî xêra le pî esazîyê newt û otomebêl û çeksazîyê û wzey etomî û pî esazîyê napêwîst û zyanbex ekanî dîke, ew rastîyeman bo derdekewêt ke lem cîhaneda xerîke çî deguzerêt û dahatûyê mrovayetî le sayey sîstemî ramyarîyê û serwerîyê çînayetîyêda çon debêt. Be pêçewaney pagendey ramyananewey, ke hokarekan bo nezanîna û nexwêndewarîyê takekan degerrênewey, derkî danî tuwane bûmîyekanî emerîka [ewaney ke koçere ewrupîyekan cînosayd/ weçebirryankirdin] lemerr parastîna jînge zor le derkî filosof zanakanî em serdeme ro întir û drusttir buwe û tenya hokar ke jînge û bûnewerekanî bem rojgare kê awe, komellgey çînayetîyê, ke lepênaw qazancî sermayedaran û serwerîyê ramyanan û m exorîyê desellatdaranda amadeyê jyan lenêwberêt, lem barewe her ewende bese, ke katî hellkirdnî re eba sernicî asmanî hewllîr û slêmanî û...tid bdeyn, ke çon kîse (dillq / 'elage) wek hêr êkî asmanî, asmanî ar dagîrdekan, ya sernicî teputoz û xollbarîn û çredûkellî eksosî otomebêlekan bden, ta têtgeyn ke bazarî sermayedarî xerîke jînge û mrovayetî berew kwê debat. Îdî ba ewe lew lawe bwestêt, ke pî esazî gu t û îremenî çî karesaêk drustdekat !

Eger lem barewe be wîrdî û hestewerîyewey sernicî helluyist û sitratîcî parte seruzekan bdeyn, ewa debîna ke ewan xwazyarîyê sermayedarîyê jîr û be bezeyîn, xerîkî amojgarîyîkirdnî aferêneranî çekî etomîn, xerîkî bzuwandinî soz û beezîyê ramyananin

beranber jînge û bûnewerekanî, xerîkî amojgarîykirdnî dellallanî bazarekanî çeksazîyê û otomebêlsazîyn. Eme boxoy be dîwekey dîkeda her so yaldêmokrasîye, ke be amojgarîykirdnî sermayedaran destîpêkrid û wîstî be be darîkirdnî cengî cîhanî duwem, mrovayetî rizgarbkat ! Lêreda letek pirsyarêk rûberrûyn, aya bebê lenêwbirdnî hokarekanî/ pêwîstîyyekanî çek û wzey etomî, bebê lenêwbirdnî handerekanî pî esazî otomebêl û newt û çeksazî û ..tid [gerranewe bo wzey sru tî (aw û ba û xor) û lenêwbirdnî sîstem û serwerîyê û m exorîyê û desellat], detwanîn jîngey parêzraw msogerbkeyn? Eger dekrêt, çon û boçî ta êsta lepênawîda karnekrawe, kê û çî rêgre û hokarekan çîn?

Ajelldestî peywendî be enar îzm û komellgey bê cînayetyewe çîye ?

Pê hemû it pêwîste le rûy zmanewanîyewe wellam be pirsyareke bdemewe, ke "bê cînayetî" nadruste û "naçînayetî druste". Înca le rastîda stemgerîyê mrov le ajellazarîyê [sêkis letek ajell û lêdan û swarbûn û zîndanîkirdnî le mall û baxçekan] û behrekê îy [bekarbirdnî ajell bo barberîyê û pî esazîykirdnî berhemhênanî go t û îremenî] û reayetîydan be ku tin û sendnewey mafî jyan le ajell kurtnabêtewe û kotayînayêt, bellku stemgerîyeke berew stemkirdin le xudî hawcorekanî mrov drêjkrawetewe. Çunke yekemîn rewayetîydan be tundutîjî û ku tar le efsanekanî drustkirdnî dunya lelayen super-hêzî aferênewe [alle/ god] be xatrî mrov, destîpêdekat û lewêda mrov xoy wek serwerî bûnewerekanî dîke wênadekat û pa an dekewête hewllî destemokirdnî hawcorekanî xoy îy. Bewatayekî dîke katêk mrov be lasayîkirdnewey drrindeyî ajellekanî dewruberî xoy, hewllî xwardinî ewanî dîkey dawê, behoy frawanî hu mendîyewe lew snûre nahu yarîyê û naçarîyaney bo zîndûmanewe newestawe û kewtuwete hewllî ku tin û koylekirdnî hawcorekanî xoy, ke le hîç ajellêkî [bûnewerêkî] dîkeda ew dyardeye nîye û tenanet drrindetîrîn ajell, ke gurg krawete hêmay, hîç kat hawcorî xoy naxwat û lewê wawetir hênde hawpi t û komellgeraye, ke hemî e pêkewe û be komell lejyandan. Bellam mrov hem bkujî hawcorekanî xoyetî, hem bxorî go tî hawcorekanî û hem koyleger û zîndanîger û fro er û kirryarî hawcorekanyetî; leyek destewajeda drrindetîrîn û bêbezeyîtrîn ajllî ser goy zemîn, drrindeyek ke be hu yarîyewe drrindayetî be plan û lêkollînewe û darri tnî sitratîc û bekarbirdnî taktîk [hunerî serwerîyê: ramyarîyê] perepêdedat û beranber hawcorekanî xoy [mrove jêrdestekan] û ajellekanî dîke û jînge deygrêteber.

Enarkîzm wek mêtodî têrraman û bîrkirdnewe le dyardekan û geyî tin be hu yarîyê, retgerewey behrekê îye, nek tenya lenêwan mrovekanda, bellku retgerewey behrekê îy mrovî e le ajellanî dewruberî, retkerewey tundutîjî û ku tinî hemû bûnewerêke. Wate enarkîzm retgerewey tawane nek tenya rexnegir le tawanbar, djî stem û behrekê îye nek tenya stem û behrekê îy le mrov, xwazryarîyê azadî jyane bo hemuwan, nek tenya bo helgranî hizrî xoy. Bêçge leme, wek tolistoy debêjêt "ta bazarî qesabxanekan germ bêt, zrim û hurî berekanî cengî berdewam debêt". Çunke yekêk le hokare here konekanî ceng û drêjekê an û manewey bo serdemî ême, rewayetîdane be ku tinî ewanî dîke lepênaw manewe û pa ayetî xud. Herweha yekêk le taybetmendîyekanî mrov rahatî û mildane be barêk, herçende pê tir neytwanîbêt, letekîda hellbkat. Ba tirînmûne rahênanî polîs û supa û deste tîrorîstîyekane her le konewe ta êsta Leser rawkirdin û serbrîrînî ajell, ke ku tin lelay dekate têkî asayî, lew barewe detwanî sernicî filmî rahînanî deste tîrorîstîye îslamîyekan le îraqî pa ruxandinî rjêmî be'si bdeyt, ke çon wek sergermîyek bedem gutin û gwêrradêran le srûde ayînîyekan, dekewne teqekirdin û serbrîrînî wi tir û ajellanî dîke.

Lelayekî dîkewe, begwêrey pi knîn û lêkollînewe zansîtîyekan derkewtuwe, ke llejawî û f arêk ke lelay ajell lekatî serbrîda drustdebêt, lerrêgey xwardînî go tekeyewe bo mrovî go xor degwêzrêtewe, eme bêcge nexo îyekan û lawazbûnî sîstemî berlexokirdnî cestey mrov behoy pa karayî ew dermananey le ke wênekanî perwerdekirdnî pî esazîyaney ajllan be ajellan dedrên betaybet pa karayî entî bayotîk. Bew core debînîn, ke ku tin û xwardînî ajell beg itî parêzer û drêjepêderî drrindayetî û tundutîjî û behrekê îy û çepandinî hawcor û corekanî dîkey ajell lelay mrov asayî û asandekat. Eger berawridî radey tundutîjî û drrindeyî mrovî caran û mrovî em serdeme bkeyn, ewa debînîn yekêk le hokarekan zorbûnî twanay go xoriye . Katêk ke mrov rêge bexoy bdat, ajellan bkujêt û bixwat û bxate xizmet xo guzeranîy xoy û le kar û le tî dîkeda behrekê îy le ajellan bkat, îdî çon dekrêt çawerrêyî ewey lê bikrêt, ke bitwanêt komellgeyekî xallî le stem û behrekê îy û tundutîjî binyatbinêt? Katêk mrov ew bûnewere bêt, ke twanîbêtî drrindeyî naçarîy û nahu yaraney ajellekanî dîke lerrêgey zansit û teknolocya û zîrekîy xoyewe be beriztrîn lûtke bgeyênêt, îdî çon detwanîn pagendekanî lemer azadî û yeksanî û dadperwerîyixwazîy be hendwerbigrîn?

[Be nezerî to so yalîzm û sermayedarî gemey xwa û ehrîmen nye ?](#)

Beboçûnî min, mrovî seretayî wek berencamî têrramanî le dewruberî û bêsnûrîy gerdûn, le bêwellamî pirsyar û serincekanîda, naçar hêzêkî sopermanî le ho û awezî xoyda afranduwe, dwabedway ewe aferênerî superhêz bo ewey xoy le yexegîrîy pirsyare çawerrwannekrawekan rizgarbkat, ew superhêzey berew bo ayî asman rewanekirduwe. Katêk ke wêray bûnî ew superhêze tirsênere , hendêk le mrovekan destberdarî xrapekarîy nebûn [hellbete xrapekarîy le rwangey kultûr û rêkewtinî komellayetîy ew komellewe], dîsanewe le bêwellamîy ew pirsyareda " bo mrovekan wek yekdî nîn û hendêkyan serkê îydeken? ", Aferêneranî super-hêz naçar be afrandinî soperhêzêkî dîke bûn; superhêzêkî serkê , taweku pasawî xrapekanî xoyanî pêbdenewe û bîkene hokar. Bellam aferêneranî soperhêz neyanzanî, ke le çêkirdnî super-hêzî duwemda yekemîn hêzî azadîxwaz wênadeken. Leberewe lew rojewe superhîzî yekem, bedest paradokis û griftêkewe gîrodeye, ke natwanêt superhêzî duwem lenêwêberêt, çunke le lenêwbirdnî ewda, xoy lenêwdebat, hokarî eme eweye, ke desellat bebê dij natwanêt pasawî bûn û pêdawîstî manewey xoy bdat. Bewatayekî dîke ne aferêneranî superhêzî yekem [mrovekan] twanay derbazbûnyan le xo bawerrîyekî mêjûîy ke xoyan beranber aferênrawekey xoyan heyane, rizgarbken û ne superhêzî yekem detwanêt bebê hawellduwaney xrapekar, ba î û pêwîstî xoy bselmênêt.

Le rastîda em cenge mêjûyye berdewamey nêwan "god / alle" û ehrîmen, leasmanekan û le xeyallî koyle xo bawerrekanda nîye, bellku le jyanî ketwarîy her rojey ême [êmey mrovî azadîxwaz û mrovî serkewtger; mrovî rencder û mrovî rencdiz û rencxor, lenêwan mrovî a tîwaz û mrovî pawanger û serwerîyixwazdaye]daye û her lêre lenêw hemû bûnêkî êmeda bûnî heye, lew katewey ke serwerîy sêkuçkey super-hêz-perestge - împrator gorrawe be serwerîy sermaye – parleman - dewllet, superhêzekanî serzewî herdem xerîkî qutkirdnewey hêzî lasar û xrapekarn, taweku pasawî manewe û pêdawîstî xoyan bdenewe.

Nexêr, ta ewendey bo boçûnî min degerrêtewe, yekem hawê eke awejû xraweterrû,

god/ alle/ dewllet serçawe û ragrî xrapekarîye û ehrîmen, ke mrove yaxîyekanin, xwazyarî azadî û rizgarî û serbexoyî û yeksanî û dadperwerîyn. Bo geyî tin bew amancane bebê lêdan û lenêwbirdnî ew hêze xrapekarey, ke ewî wek koyle ragirtuwe û bebê lenêwbirdnî koyletî xoy, esteme ew bazne daxrawey berdewamîy çewsanewe bi kêt û mrov be qonaxêkî ballatir le ge ey kesayetî [takî azad] bgat. Bewatayekî dîke koyle bo rizgarbûnî le kotubendekan, pêwîste koyleyetî lenêwberêt, ew lenêwbirdne tenya be gorrînî komellgey çînayetî bo komellgeyekî naçînayetî, wate lenêwbirdnî zemîne û hokarekanî koylebûn [darayî taybet , karîkrêgirte , serwerîy mrov beser mrovewe] meyserdebêt !

Bo xwêndnewey be î yekem, kirte leser em besterey xwarewe bke

Be î yekem : <http://wp.me/ppHbY-HN>
Be î duwem : <http://wp.me/ppHbY-HY>
Be î sêyem : <http://wp.me/ppHbY-If>
Be î çwarem: <http://wp.me/ppHbY-IH>
Be î pêncem: <http://wp.me/ppHbY-IK>
Be î e em: <http://wp.me/ppHbY-Jb>
Be î hewtem : <http://wp.me/ppHbY-Jm>
Be î he tem : <http://wp.me/ppHbY-Jt>
Be î nohem: <http://wp.me/ppHbY-JM>
Be î dehem : <http://wp.me/ppHbY-JR>
Be î yazdehem : <http://wp.me/ppHbY-K3>
Be î dwazdehem : <http://wp.me/ppHbY-K7>
Be î syazdehem : <http://wp.me/ppHbY-Kc>